

## Komara Îslamî berev daşikanê

»»»» R:3




*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (309) 06-09-2017 Buha (1000) Tûmen*

# Bajar îradeya xwe selimand

# Em hemû kolber in



**Piştî vê ku roja 13`ê Xermana 1396`an (4`ê Îlonê) du kolberên kurd xelkê bajarê Banê, bi navên Heyder Ferecî temen 21 salî xelkê gundê "Şeşe", û Qadir Behramî temen 45 salî xelkê gundê "Vizmelle" ketin ber destrêja gulleyên hêzên leşkerî yên rejîma Îranê, xelkê bajarê Banê li Rojhilata Kurdistanê li dijî vê kiryara hovane ya rejîma Îranê, serî hildan.**

Malbatên her du kolberên Kurd yên ku hatine kuştin, fermandarê bajarê Banê wekî sebebkarê serekî yê vê bûyerê dizanin, û dibêjin ku teqekirin li wan kolberan li ser biryara Mihemed Felahî fermandarê bajarê Banê bûye.Li ser vê bingehê bû, ku roja borî xelkê cesûr ê Banê bi dar û keviran êrîşî ser fermandariya bajarê Banê kirin, û pêpikên rejîmê di vî bajarî de lerizandin. Rejîmê jî di hember de hawara xwe bire

»»»» Dom R:2




## Deftera Siyasî a PDKÎ daxuyaniyek derheq bûyerên bajarê Banê de belav kir

**Derheqê şer û pevçûnên bajarê Banê, Deftera Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, daxuyaniyek belav kiriye, ku di vê daxuyaniyê de, tevî bilindnirxandina helwêsta cesûrane a xelkê bajarê Banê û derdora wê, dawxaza hevhelwêstiya civatên xelkê Kurdistanê hatiye kirin.**

Deqa daxuyaniyê bi vî awayî ye:

Serkut û kuştina sîstematîk û bi bername ya kasibkarên gund û bajarên ser sînor yên Kurdistanê, ji aliyê komara Îslamî a Îranê ve, di heyama çend salên derbazbûyî de, beşeke veneqetiyayî bûye ji siyasetên wê rejîmê, ku roj bi rojê berfirehtir dibe, û canê hemwelatiyên zehmetkêş û kasibkaran dike armanc.

Tenê di heyama kêmtir ji salekê de, dehan kasibkar bûne qurbaniyê siyasetên serkutkerane, û herwiha hejarhêştina hemwelatiyên Kurdistanê ji aliyê komara Îslamî a Îranê ve. Di doma rewşa kuştin û êrîşkirina bo ser kasibkarên deverên sînorî yên kurdistanê, û di rêkevta 4`ê Îlona 2017`an de, du kasibkar bi navên "Qadir Behramî" temen 45 salî xelkê gundê "Vizmelle" û "Heyder Ferecî" temen 21 salî xelkê gundê "Şeşe" a ser bi bajarê Banê jiyana wan jê hate standin.

»»»» R:2

## Dr. Xelîqî: Armanca Îranê, mijûlkirina Kurd û Şî`e ye bi şerê DAÎŞ`ê

»»»» R:8



## Bajar serî rakir

»»»» R:2



## Jînenîgariya Nadir Nadirov serokê Rûmetê yê Yekîtiya Kurdên Sovyêtê

»»»» R:10



www.agirsivakurd.org

## Sergotar

# Bajar serî rakir

**N: Kerîm Perwîzî**

Roja 14`ê Xermanana sala 1396`an, roja eşkerekirina kerb û bêzariya xelkê mafxwaz ê Banê li dijî stem û bêdadiyê û sivikatiya sîstematîk li hemberî Kurd ji aliyê rejîma Tehranê ve bû. Roja pêştir di dema şefeqeke rohn û bi berçavê rojê, hêza çekmepoş a pasdarên rejîma Îranê teqe li kolberan kirin, ew kolberên ku bar hilnegirtibûn, û bi destên betal, û bêhêvî ji birina pariyeke nan bo ser sivka (sifreya) zarokên xwe, vedigeriyane mal. Du kolber hatin kuştin û pasdarên terorîst xwîn birin ser sifreya zarokên van kolberan.

Eva yekem sivikatî û stem nebû, û mixabin ya dawiyê jî nabe, lê stemkarî ew qas rohn û zelal e, ku xwîna xelkê keland, û di kiryareke medenî û aştîxwazane de, bajar daxistin, û çûne pêşberî fermandariyê, da ku daxwaza dadperweriyê bikin.

Lê her cure kiryareke mafxwazane, ji aliyê rejîma Îranê ve, wekî gefek li ser ewlehiya wê ya lerzok tê dîtin, lewra dubare bi gulleyan bersiva xelkê da. Heya niha bas ji kuştin û birîndarbûna nêzî 20 kesî ji xelkê Banê tê kirin, û hejmara destbiserkiriyan jî rohn û zelal nine.

Ew helwesta bajarê Bane bi hinek deskarî û bi hinek anîn û birina vir û wir de, em dikarin wekî riha zal bi ser bajarên Kurdistanê de bidin nasandin. Bi vê watayê ku rewşa civakî û siyasî û aborî û rewşa derûnî ya Kurdistaniyan bi giştî di asteke weha de ye.

Ji vir ve bi awayekî giştî em dibêjin, bajar avis e bi eşkerekirina bêzariyê di hemberî hemû kiryarên rejîmê de, û dixwaze ku vîn û îradeya xwe biselimîne. Bajar nasekine, û ketiye nava liv û tevgerê de, û ser teqînê ye, ew jî ji xwe re nine, belkû derbazbûyek ji xebata xwe û xortên xwe û bi sedan sivikatiyên stemkaran ceribandiye, û niha êdî bajar dixwaze li çarçoveya Rasanê de rabe ser xwe.

Di vir de du tişt girîng in:

Yekem, bajar radibe, û bo rabûn û serkevtinê jî, dibe rêkxerî û rênimayî bo diyarîkirina riya gihîştina bi peravê azadiyê hebe, û bajar daxwaz dike ku rêkxirawên siyasî û xebatkar rênîşander bin. Di vê veguhastina qonaxa ber bi rabûnê de, hekî rêkxiraw di asta çavnihêriya bajar de nebin, bajar li benda wan namîne, yan wê riya xwe bibîne, û rêberên xwe berhem bîne, yan jî ew rabûn wê bê jirêderxistin. Ew yek hişdariyeke bo hemû xebatkarên rasteqîne.

Duyem, bajar bi hemû awayekî aştîxwazane daxwaz û mafên xwe aniye ber bas, û heya daxwaza kolberî û mandîbûnê jî bi gulle bersivandiye. Rejîma Komara Îslamî her cure kiryarekê di Kurdistanê de siyasî dibîne, ewlehiya lerzok ya rejîmê jî bi van kiryaran tê selimandin.

Jiber ku rejîmeke cihgirtî hemû hûrdekariyên jiyanê jî nake siyasî, lê dema ku nanê kolberiyê jî dibe siyasî, û Spaha Pasdaran ji tirsa Kurdistanê teqê li wan dike, diyar e ku ew rejîma heya çi qasî lerzok e.

Gulleyên rejîmê ku di hemû dem û kiryar û bûyerekê de, deng jê tê, û xelkê dipêke, êdî ji aliyê xelkê ve nahê tab û tehemulkirin, û rojekê bajar wê bigihîje vê biryarê ku êdî dibe dest bo çekê bibe, û di nava dilê bajar de, koşka lerzok ya Cemaranê bike armanc.

### »»»» Doma daxuyaniya Deftera Siyasî

Li hember vê tawana rejîma İslamî, xelkê bihelwêst û bêzarbûyî yên bajarê Banê û derdorê, ku pêştir jî berbirûyê zilm û zordarî û serkutê ji aliyê hêzên rejîmê ve bûne, dijayetiya xwe anîn ziman, û di roja derbazbûyî de û îro jî (4 û 5`ê Îlonê) nerazîbûnên giştî rê xistin, û di civîneke berfireh de, û bi helwêsteke netirsane, êrîşî ser navenda deshilata rejîmê, li bajarê Banê de kirin, û binkeya fermandariyê kirin armanc, û ji aliyekî din ve bi daxistina dukan û bazaran nerazîbûna xwe li hember vê bûyera dilgiran anîne ziman.

Hewceyî basê ye ku, şer û pevçûn di navbera hêzên serkutker yên rejîmê û komên hemwelatiyên bajarê Bane heta dema amadekirina vê ragehandinê jî, her berdewam e, û herwiha li gora zanyariyan rejîmê hêzekî zef ji bajarên derdorê ve ber bi wî bajarî şandine, û hikûmet nizamiyeke tewaw (rewşa awarte) li ser bajar de zal e, û hejimarek ji xwenîşanderan hatine binçavkirin.

Em tevî şermezarkirina kiryara dijîgeliyane ya rejîmê di kurdistanê de, li hember kasibkarên Kurd, û ev hereketa azayane ya îro û duh a xelkê bihelwêst yê bajarê Banê û derdorê bilind radigirin, û daxwaz ji hemû tex û çînên civaka Kurdistanê dikin, ku yekrêz û yekhelwêst bin, û dengê xwe bixine kêlega hereketên wiha de, û bi hevxebatî û yekîtiyeke bihêz ve, berbirûyê siyasetên serkutkerane ên rejîmê bibin.

Di dawiyê de, piştevaniya xwe ji bo vê hereketa bivêrane û şoreşgerane a xelkê bajarê Banê û yên derdorê radigehînin, hereketek ku wekî remz û nîşana girêdana xebata çiya û bajar tê hesibandin.

**Partiya Demokrata Kurdsitana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**5`ê Îlona 2017`an**

### »»»» Doma nûçeya manşêtê

ber tundûtîjiyê û teqekirina li xelkê medenî, ku di encamê de, çendîn kes birîndar bûn. Xelkê nerazî di vî bajarî de, trombêleke fermandariyê şewitandin, û hejmarek ji xelkê nerazî jî çûne nava avahiya fermandariyê de.

Di encamê de ji bilî birîndarkirina çendîn kesan ji aliyê hêzên rejîmê ve, çendîn kes jî hatin destbiserkirin. Rejîmê hêzeke zaf li dijî xelkê medenî anîbû nava bajar û derdorê, û hilîkopter jî li ser esmanê vî bajarî çavdêriya rewşê dikir.

PDKÎ bi weşandina daxuyaniyekê piştgiriya xwe ji xelkê Banê ragehand, ku di beşeke vê daxuyaniyê de hatibû: "Em tevî şermezarkirina kiryara dijîgeliyane ya rejîmê di kurdistanê de, li hember kasibkarên Kurd, em vê hereketa azayane ya îro û duh a xelkê bihelwêst yê bajarê Banê û derdorê bilind dinirxînin, û daxwaz ji hemû tex û çînên civaka Kurdistanê dikin, ku yekrêz û yekhelwêst bin, û dengê xwe bixine kêlega hereketên wiha de, û bi hevxebatî û yekîtiyeke bihêz ve, berbirûyê siyasetên serkutkerane ên rejîmê bibin. Di dawiyê de, piştevaniya xwe ji bo vê hereketa bivêrane û şoreşgerane a xelkê bajarê Banê û yên derdorê radigehînin, hereketek ku wekî remz û nîşana girêdana xebata çiya û bajar tê hesibandin".

Ji aliyekî din ve RMMK`ê jî bi weşandina daxuyaniyekê ragehand ku serederiya hêzên rejîmê digel hevwelatiyên Bane, binpêkirina mafê mirovan û kiryareke nemirovane û neberpirsane ye.

Di hemberî vê nerazîbûna xelkê Banê, nûnerê henga sînorî ragehandiye ku hebûna hizbên Kurdî ên dijberî Îranê li ser sînoran, bûye sedema vê ku hêzên leşkerî xelkê bidin ber gulleyan. Ew hêcetanîna wî nûnerî di demekê de ye, ku eva yekem car nine ku kolber bibin armanca gulleyên ras terast ên hêzên rejîmê, û ew hêcetanîn jî tenê bona xapandina xelkê ji aliyekî û tawanbarnîşandana PDKÎ û hêzên din ji aliyekî din ve ye.

Kuştina berfireh a kolberan di halekî de ye ku, di demên derbazbûyî de jî, cêhgirê siyasî û ewlehî û civakî yê parêzgeha Sine ragehandibû ku: "Bi eşkereyî dikarim bêjim ku di dema hatine ser kar a dewleta "tedbîr" û "omîd" heta niha, tenê yek kolber jî li ser sînorên kurdistanê nehatine kuştin, yan jî birîndarkirin.

Heta niha tu kesayetiyekî hiquqî û heqîqî, derheqê teqekirina rasterast a li kolber yan jî kasbkarên li ser sînorên kurdistanê, lêpirsîn jê nehatiye kirin, û dosiyeya dadwerî (qezayî) ya kesên birîndar yan jî kesên ku jiyana xwe ji dest dane, bi maneya "parastina sînoran", negihîştiye encameke rohn û zelal. Mam Qadir Behramî xêzandar û xadiyê 4 zarokan bû. Ev du kolberên Kurd li nêzî gundê Hengejale a ser sînorê bajarê Banê, ketne ber destrêja gulleyên hêzên rejîma Îranê.

# Komara Îslamî berev daşikanê



**Mistefa Hicrî**

Siyaseta Komara Îslamî her ji destpêka avabûnê ve şandina şoreşê bo derve bûye, ku ew jî tê wateya zêdexwaziyê, û di hemû vê heyamê de vê rejîmê kar kiriye bo pêşvebirina vê siyasetê, û di gellek biyavan de jî serkevtî bûye, û ew serkevtin jî hemû li ber vê nebûye ku avaker û birêveberên wê kesên gellek şareza û hilkevtî û bêhempa bûne, belkû gellek zêdetir li ber hinek valahiyan, di van navçeyan û mifahwergirtina ji wan betaliyan bo berjewendiya xwe bûye. Rûxandina hikûmeta Taliban di Efxanistanê ji aliyê Amerîkayê ve, rûxana hikûmeta Be`is li Bexdayê wekî du dijminên bihêz ên Îranê di navçeyê de, û xwedûrkirina Eebistanê ji destêwerdana di Îraqê de, û bicihhêlana wê bo Îranê, piştî êrîşa Sedam bo ser Kowêytê, û lawaziya hikûmeta navendî ya Sûriyê, û meydandariya wan di şerê li Sûriye û Îraqê, û pêkhatina van valahiyan bû ku ew derfet bo rejîmê pêk anîn, ku bixwe hewlek bo pêkanîna van derfetan dabe, û ji hemiyan girîngtir siyaseta derve ya Amerîkayê di dema serokatiya Obama bi taybetî di heyama çar salên dewra duyem de, bi pêşgirtina siyaseta sazana digel rejîmê, û gihandina encamê ya gotûbêjan ya welatên 5+1 bi vê hêviyê ku ew siyaset dibe sedema guherîna siyaseta rejîmê, û Îranê ji vê siyasetê gellek mifah wergirt, û deshilat û nifûza xwe di vê navçeyê de zêde kir.

Lê di şeş mehên dawiyê de, û piştî ku "Trump" hate ser kar, guherîneke kûr di siyaseta Amerîka û welatên navçeyê de li dijî berjewendî û pêşrewiyên Komara Îslamî pêk hat, ku bû sedema aloizbûna xewnên rejîmê.

**Ew guherînên kûr çi ne?**

Yekem: Guherîn di siyaseta Amerîkayê ên niha de, pêk tê ji guherîna siyaseta rejîmê li serdema Obama, berev guherîna rejîmê li serdema "Trump" de.
Herçend dariştina siyaseta Amerîkayê derheq bi Îranê biryar e di dawiya vê sala zayînî de tewaw be, lê ji niha ve em dikarin bêjin ku siyaseta nû li ser guherîna rejîmê yan aliyê kêm, li ser daketina rejîmê ji serberedayiyên xwe di navçê û çavdêrîkirina tund dadirêje.

Niha Bercam (1) astengek e li ser riya zextxistina zêdetir ya Amerîkayê li dijî Îranê, ji ber ku heya niha Ajansa Etomî ragehandiye ku Îran, bi rêkevtinê pêbend bûye, Amerîka di vê rewşê de, naxwaze ku ji aliyê xwe ve became hiloşîne, li ber alîkariyên Ewropî, lewra dixwazin ku Îran li jêr zexta zor de, bixwe rêkevtinê hilweşîne. Bo vê mebestê zexta li ser Îranê roj bi roj zêdetir dibe, û Bab Kurkir serokê Komîteya Pêwendiyên Derve a SINA`yê dibêje ku: "Hekî em rêkevtina etomî bi tundî jî bi rê ve bibin, û ji Îranê jî me ew yek bivêt, renge Îran li jêr vê zextê de, pêbend nebe bi rêkevtinê, wê demê eva ew in (Îran e) ku rêkevtin têk daye. Komara Îslamî jî bi domandina siyasetên xwe ên şaş rewşeke baş bo zextranîna Amerîkayê pêk anî, ku zextê bixe ser Îranê.

Spaha Pasdaran roja 18`ê Hezîrana 2017 çendîn mûşek avêtin Dêrelzorê li Sûriyê, û roja 4`ê Tîrmehê mûşekeke balistîk taqî kir, û 29`ê Tîrmehê jî, mûşekek sîmorx avête valahiya esman. Piştî van mûşek avêtinan, Amerîka ne tenê her komeke gemaroyan xiste ser Îranê, ku ya herî girîng xistina Spaha Pasdaran e bo nav rîzbenda terorê de, belkû niha daxwazê dikin ku dibe hinek ji navendên Îranê lêgerînê tê de pêk bînin, ku di nava wan de, çek û mûşekên Îranê hene, rejîmê ew daxwaz bi tundî ret kiriye. Kurkir dibêj: Hekî Îran îzna lêgerîna van navendan nede, wê demê mecala hewce pêk tê.

Niha hejmareke berçav ji deshilatdarên dewleta "Trump" ji wan kesan pêk tînin, ku bi awayekî cidî daxwazkarê guherîna rejîma Îranê ne, û her du hizbên Komarîxwaz û Demokrat jî di kongireyê de bona zextxistina ser rejîmê û paşekêşekirina bi rejîmê hevboçûn in.

**Duyem: Astengî û guherînkariyên pêşberî rejîma Îranê di navçeyê de**

Komara Îslamî têçûyeke zaf da, da ku bikare hîlala Şî`e ku pêk tê ji zeliqandina Tehranê bi behra Medîterane ji riya Bexda, Dîmeşq û Beyrûtê ve, tewaw bike, lê Amerîkayê bi lihevkirina digel Rûsiyê, ew pîlana rejîmê pûç kir, di vê sazanê de, ew du mezinhêz ji başûr û başûra rojavaya Sûriyê, navçeya aram û bê şer pêk anîn, ku Amerîka îdare dike. Lavrov di gotûbêjekê de, bas ji pêkanîna du navçeyên din ên bi vî rengî kir, ku di vê sazanê de rejîma Îranê piştguh ve avêtin. Îranê pêştir dixwast ku di vê navçeyê de, cihgir be, û ew cih bi başûra Lubnanê ve girê bide, û metirsiyeke din li ser Îsraîlê pêk bîne.



Ji wê demê ve ku "Trump" hatiye ser kar, berevajiyê dewleta Obama bi dehan binkeyên leşkerî û çar firokexane li Sûriyê ava kirine. Sînorê Îraq û Sûriye xistiye bin çavdêriya xwe de, û kontrola vê sînorê astenga herî mezin bo hîlala Şî`eya Îranê pêk tîne, û roj bi rojê zêdetir fişarê bo Îranê tîne ku wê ji Sûriyê derxînin.Hinek ji çavdêrên siyasî ser vê bawerîyê ne ku li egera şerê Îran û Amerîkayê ew şer ji Sûriyê ve dest pê dike.

Hekî di destpêka şerê Sûriyê û di encamê de jî, nemana deshilata navendî ya Sûriyê bi ser piraniya beşên axa Sûriyê, valahiyeke mezin ya deshilatê di vî welatî de pêk hat, û Komara Îslamî bû girîngtirîn deshilat li wir de, û bi dilê xwe, li wir reftar dikir, lê bi hatina Rûsiyê û piştre jî Amerîka û piştre jî bi hilbijartina "Trump" wekî serkomar, rejîma Komara Îslamî ya Îranê roj bi rojê zêdetir hate piştguhxistin. Niha ew welatên di Sûriyê de, biryarder in, li gora girînigiyê pêk tên ji Rûsiye, Amerîka, Îsraîl û Tirkiye. Di nava van welatan de, xeynî Rûsiyê her sê welatên din li dijî hejmonî û deshilata Îranê ne, û Îsraîl û Amerîkayê çendîn carî bi awayekî eşkere ragehandine ku Îran dibe li Sûriyê here derve, û guman tê de nine ku Rûsiye jî bo parastina berjewendiya xwe di Sûriyê de, û nêzîkbûna bi Amerîka û Îsraîl û Tirkiyê, hertim amade ye ku dev ji Îranê berde, û bi taybetî opozisyona Beşar Esed û Erebistanê ku bi tundî li dijî Îranê ne. Bi vê pêkê, Îran di Sûriyê de dikeve qeraxê, û nîşaneyên wê piştguhxistin û daşikandinê her niha xûya dibe.

**Li Îraqê**

Piştî paşekêşeya hêzên Amerîkayê ji Îraqê heya heyamekê berî niha ew welat zêdetir meydana cilîdanê ya Îranê bûye, bi taybetî piştî dagîrkirina beşek ji Îraqê bi ji aliyê DAÎŞ`ê ku Komara Îslamî bi hêceta şer li dijî DAÎŞ`ê roj bi rojê pêgeha xwe qahîmtir kir.

Erebistanê piştî êrîşa Sedam Husên li ser Koweytê 27 sal bû ku ew welat bi cih hêlabû, û niha Erebistan gellek bi cidî vegeriyaye Îraqê, ku ew karê Si`ûdiyan digel pêşwaziya germ ya Sunniyan û heya wan Şî`eyên ku nasnameya Erebî ya xwe pêş Şî`ebûnê dadinên û ji deshilata Îranê li Îraqê de nerazî bûn, berbirû bû. Vegeriyana Erebistanê bo Îraqê bi sefera Adil El-cobeyr Wezîrê Karê Derve ê Erebistanê dest pê kir, û piştre sefera Heyder Îbadî serokwezîrê Îraqê bo Riyazê û hevdîtina bi Melik Selman paşayê Erebistanê re, û sefera hejmareke din ji karbidestên din ên payebilind ên hikûmetî ên herdu aliyan li pey xwe anî, ku cara dawî sefera Wezîrê Navxwe ê Îraqê bo Erebistanê bû, û îmzekirina rêkevtina jihevtêgihîştina ewlehî, aborî, bazerganî û çandiniyê di navbera wan du

www.arsivakurd.org

welatan de lê ket.

Bi taybetî rêkevtina Bexda û Riyazê bo kontrolkirina sînorên xwe, û xebata li dijî terorîzmê, nîşana lihevnêzîkbûna berçav ya Bexda û Erebistanê bû, niha her du alî mijûl in, riya esmanî ya di navbera du paytextan vekin, Si`ûdî bi alîkariya Mîsrê niha di hewl de ne, Îraqê vegerînin bo nav civaka Erebî bi armanca dûrxistina ji Îranê.

Xala din ya cihê baldanê li daşikandina Komara Îslamî di Îraqê de, ji bilî tûreyiya girûpên Sunnî û sekolar ji vegeşandina deshilata Îranê di raqê de, heya girûpên Şî`e jî, ku zêdetir ji baweriya ayînî, neteweyî ne, daxwazkar in ku taqmên biyanî welat bi cih bihêlin.

Yek ji wan kesayetiyên xwedînifûz di Îraqê de, Muqteda Sedr e. Navbirî ku çend salek bû ji aliyê Îranê ve piştevaniyeke berçav jê dihate kirin, di van salên dawiyê de, wekî yek ji kesayetiyên herî girîng ên ayînî ên Şî`eyê Îraqî, bi eşkere li dijî destêwerdanên Îranê li Îraqê sekiniye. Sedr di daxuyaniyeke 29 xalî de, ku 20`ê meha Şibata 2017`an wekî rêçareya aştiyê di Îraqê de belav kir, pêşniyara hilweşandina Heşda Şe`ibî kir, ku daxwazkarê derkirina tewahiya hêzên biyanî (heya dostên Îraqê jî-mebest Îran e) bû. Ew gotinên Muqteda Sedr bûne sedema nîgeraniya Komara Îslamî.

Berdevkê Wezareta Karê Derve ê rejîmê, di civîna heftane ya digel rojnamevan li Tehranê hêvî xwast ku gotinên Muqteda bi "şaşî" hatibe wergerandin, yan bi şaşî hatibe belavkirin.

Lê çend rojan piştî van axavtinên Behram Qasimî berdevkê Karê Derve ê Îranê, Sedr di gotûbêjekê de digel "Elşerq El-ewset" dibêje: Di hevdîtina xwe di Cede ya Erebistanê digel Welîehdê Erebistanê boçûneke wekhev hebûne, ji vê jî girîngtir Sedr Erebistana Si`ûdî bi "bavê bihêz" ê neteweya Ereb nav bir, ku "Bona avakirina aştiyê di navçeyê de tekoşînê dike".

**Di navxwe ya Îraqê de:**

Di hemû welatekî de, siyaseta derve ya hikûmetê encama siyaseta navxweyî ye, bi vê watayê ku demekê siyaseta navxwe ya rejîmê siyaseteke seqet ya paşvemayî ye, ku li ser bingeha Îslama Şî`e ya Wilayeta Feqîhî hatiye darêtin, ew siyaset ji bilî teorî di biyavê piratîkê de jî, bi sala ye netebahiyên wê digel cîhana vê serdemê hatiye selimandin, û dakişana wê jî sal bi salê zêdetir derketiye, lê di heyama 5-6 mehên borî de, ew dakişan jî, eşkeretir û bileztir xwe derxistiye:

Di biyavê aborî de jî, bazerganiya cîhanî ya her welatekî xudîka guhertinên aborî ya navxweyî û pêwendiyên aborî digel cîhanê û bi awayekî em dikarin bêjin ku ew yek çawaniya siyaseta wê ya derekî ye.

Piştî qewlên zaf ku digotin piştî bercamê aboriya welat vedigeşe, amara bazerganiya Îranê digel cîhanê di heyama çar mehên vê salê de, van rojan ji aliyê gumrika Îranê ve hatiye belavkirin.

Encama vê amarê bi kurtî vê rastiyê nîşan dide ku şandina kelûpelên (xeyrî neftî) zêdetir ji %9 kêm kiriye, û anîna jor ya kelûpelan jî %23 li çav heman wext di sala borî de, zêde kiriye. Ew pêvajo bûye sedema vê ku balansa bazerganî ya cîhanî ya Îranê di vê heyamê de, berevajiyê par, nîgatîv be.

Xaleke din ya girîng di vê amarê de, ku cihê balkêşanê ye, ew e ku ew welatên kelûpel şandine Îranê, pêk tên ji Çîn, Îmarata Yekgirtî, Kureya Başûr, Tirkiye û Hindustan û wan welatan jî ku kelûpelên Îranê kirîne, teqrîben her ew welat in.

Ew amar vê yekê nîşan didin, ku şirîkên bazerganî ên Îranê her welatên Asyayî û navçeyî ne. Sedem jî vedigere bo vê rastiyê ku navendên bazerganî û navneteweyî û welatên Rojavayî bi sedema rîska bilind ya siyasî amade nînin ku di Îranê de sermayeguzariyê bikin, berevajiyê hêvî û xwaziyên Rûhanî di dema îmzakirina bercame de.

**Binpêkirina mafê mirovan:**

Rêkxirawa Lêborîna Navneteweyî di raporekê de ku roja Çarşemiyê rêkewta 11`ê Gelawêjê belav kiriye, îşare bi vê dike ku di sala 2013`an ya Zayînî de heya niha dezgeha Dad û demûdezgehên ewlehiyê ên rejîmê serkuta berevankarên mafê mirovan tundtir kiriye.

Herwisa îşare bi vê dike ku tohmeta beşek ji mehkûman pêwendîgirtina digel navendên YE û yan NY û rêkxirawên navdewletî ên mafê mirovan bûye. Ew kes bi tawana pêngavhilgirtina li dijî ewlehiya welat têne mehkûmkirin û herwisa ew mehkûmane parêzerê berevankarên mafê mirovan û nûnerên sendîkayên kedkarî û çalakên mafê jinan û nehêştina bidarvekirinê û berevankarên mafê kêmaniyan in.

Ew rapor Hesen Rûhanî û dewleta wî tawanbar dike bi vê ku heya niha hewleke berçav bo berbirpbûna digel van binpêkirinan ku binpêkirina eşkere ya mafê mirovan in, yan aliyê kêm, kêmkirina wan nedaye.

Ji bilî van kêşeyên ku me îşare pê kirin, hinek diyardeyên wekî bêkarî, nexweşiyên civakî, tawan û hejarî, herwisa di vegeşînê de ye, ew yek jî, ne tenê çavdêrên bîhanî belkû berpirsyarên rejîmê ên herî payebilind jî, pêdagiriyê li ser dikin, ku her yek ji wan bixwe hilgirê bas û mijarên cuda ne. Lê çend diyardeyên ku encama nakamiyên rejîmê û têkşikandina siyasetên dereki û navxweyî ên rejîmê di heyama 5-6 mehên borî de bû, gellek zeqtir bûne, û li ber girîngiya encamên wê di dirêjheyam de, hewce ye ku îşareyeke kurt em pê bikin:

Kêşeya di navbera baskên binajoxwaz bi serokatiya Xamineyî ji aliyekî û reformxwaz ji aliyekî din ve, bi şêweyekî berçav geşe kiriye, bi şêweyekê ku di destpêka pêkanîna pêvajoya reformxwaziyê de heya niha bêmînak bûye.

Ew kêşane hekî berdewam bin, kêşeyên rîşeyî û bîrûbawerî ne, û bi tundî kirîzafirîn in, ku li gora asta şikestên siyasî ên rejîmê zêdetir geşe dikin, jiber ku her yek ji baskên rejîmê dixwaze ku şaşiya van têkşikanan û di encam de, rewşa xirap ya rejîmê û jiyana pirr ji bedbextiya xelkê bixe stûyê aliyê din, û xwe bê tawan nîşan bide.

**Bila em îşarê bi hindek ji van kêşe û cudahiyan bikin:**

Wê demê ku Hesen Rûhanî bona selmandina dirustiya siyaset û kiryarên xwe, derheq gotûbêja Îmam Hesen daxive, Xamineyî bersiv da ku ew yek çewtekariya dîrokê û kesayetiya Îmam Hesen e.

-Dema ku derheq aştiya Îmam Hesen qise kir, Xamineyî bersiv da û ew gotin ret kir.

-Hesen Rûhanî di hewla gotûbêja digel Amerîka û bercam a navçeyî û navxweyî ye, di halekê de Xamineyî bi awayê reha (mutleq) Amerîka bi peymanşikên dizane ku nabe gotûbêj digel de bê kirin, û li dijî bercama

**Dûredî-menê pêşeroja Îranê, Îraneke şikestxwarî ji derve, di biyavê aborî û siyasî de piştguhxistî, di navxwe de, berevrû digel kêşeyan û netebahiyên kelekebûyî ye**

navçeyî ye jî.

-Rûhanî heya radeyekê zaf, alîgirê gotûbêja digel Rojavayiyan û navendên mafê mirov e, Xamineyî dibêje ku eva em in ku alîgirê mafê mirovan in, û Rojavayî ne ku mafê mirovan binpê dikin.

Xamineyî di biyavê ferhengî de, gellek bi tundî li dijî bernameyên ferhengî ên dewleta Rûhanî ye.

-Di biyavê aborî de, Xamineyî li dijî vekirina Îranê bi rûyê derve û sermayedanîna derekî ye, jiber ku navbirî li ser vê baweriyê ye ku zanista aborî, Rojavayî ye, û li ser hinek şert û mercên xeyrî Îslamî hatiye avakirin, lewra ew piştgiriyê ji aboriya nezelal a Îslamî dike, û navê wê jî daniye aboriya bergirîkarane (iqtisadê Muqawimetî). Ew cudahî û bi dehan cudahiyên din, di navbera wan van du baskan de, di heyama piştî hilbijartina dubare ya Rûhanî û êrîş û pûçkirina boçûnên yektir, qet bi qasî vê heyamê zelal, êrîşkarane (her yek bi awayê xwe) û bi eşkere rû nedaye.

Nêzî mehekê berî niha di nava fermandên asta serve ya Spaha Pasdaran û Rûhanî de, civînek pêk hat, û hinek ji çavdêrên siyasî wisa şirove dikirin ku ku ew civîn, civîna aştiyê ye di navbera van du baskan de, lê her di xutbeya niwêja Înê de, piştî vê hevdîtinê, Ehmed Cenetî

www.arsiv.kurdiyakurd.org

## PDKÎ û PKK li hev civiyan

**Heyeteke KCK`ê serdana Deftera Siyasî ya PDKÎ kir, û ji aliyê PDKÎ ve hate pêşwazîkirin.**

Roja Çarşemiyê 8`ê Xermananê heyeteke Deftera Siyasî ya KCK`ê bi serperestiya Serhet Warto berdevkê PKK û endamê rêberî û berpirsê dîplomasiya PKK`ê serdana Deftera Siyasî a PDKÎ kir û ji aliyê heyeteke hizbê ve bi serperestiya Mihemednezîf Qadirî endamê Deftera Siyasî ya hizbê ve pêşwazî jê hate kirin.

Di civîneke dostane de, Qadirî şiroveyeke siyasî li ser rewşa siyasî û dakişana Komara Îslamî ya Îranê, û rola nîgatîv di navçeyê de, û hewldan bo pêkanîna ajaweyê û herwisa bihêzkirina girûp û aliyên tundrev ên navçeyê bo mebesta taybetî kir.

civîna fermandarê hêzên çekdar ên Komara Îslamî û Tirkiyê û hewla hevbeş ya her du aliyan li ser Kurd tewereke din ya rûniştina di navbera PKK û PDKÎ bû, piştre Serhet Warto tevî piştrastkirina lêkdanewe û lênihêrînên PDKÎ li ser komdengiya zêdetir û bihêzbûna Kurd di her du beşan de, dîtingeha PKK bas kir, û ragehand ku ew metirsiyên ku egera wan heye, nabe em kêm bigrin.

Hêjayî basê ye ku di vê civînê de, çendîn pirsên pêwendîdar bi her du




aliyan ketin ber bas, û pêdagirî li ser pêwendiya qahîm û dostane ya di navbera PDKÎ û PKK hate kirin. Piştre kongireyeke rojnamevanî ji aliyê Mihemednezîf Qdirî û Serhet Warto ve bo kanalên ragehandinê hate sazkirin, û li ser derfetan û metirsiyên li pêşberî Kurdên her du beşan axavtin hate kirin, û her du aliyan

## PDKÎ û YNK di bajarê Soranê de, li hev civiyan

**Heyeteke Partiya Demokrata Kurdistana Îranê, digel berpirsên Malbenda 6 a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê, di bajarê Soranê de civîn pêk anî.**

Spêdeya roja Dûşemî 28`ê Tebaxa 2017`an, heyeteke birêveberên PDKÎ bi serperestiya Mihemednezîf Qadirî endamê Deftera Siyasî a PDKÎ serdana Malbenda 6 a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê, di bajarê Soranê de kir.

Heyeta Partiya Demokrat di vê serdanê de, ji aliyê heyeteke Malbendê bi serperestiya Şaxewan cîgirê malbendê û Luqman Werdî cêgirê malbendê û herwiha bi serperestiya berpirsên komîteya bajarê Çomanê pêşwazî ji wan hat kirin.

Di destpêkê de, Mihemednezîf Qadirî hevxemiya PDKÎ digel jiyan ji destdana 2 têkoşerên Yekîtiya Nîştîmanî a Kurdistanê eşkere kir, ku di vê bûyera nexwastî a Gunde Jorê de jiyana xwe ji dest dabûn.

Qadirî herwiha tekez li ser dostîniya navbera hêzên siyasî yên Rojhilat û Başûr kir, bi taybet pêwendiyên demdirêj yên Partiya Demokrat digel xelkê devera Balekayetî û rênedan bi neyarên kurdên her 2 beşan û rênedan bi rejîma Îrsamî a Îranê, ku agirê duberekî û nakokiyê di navbera wan de dirust bike, daku ji ava şêlû masiyan bigre.




Piştre hevalên Malbenda 6 a bajarê Soranê tekez li ser pêwendiyên digel Partiya Demokrat kirin û herwiha hevahengî û alîkarîkirina di navbera hêzên siyasî û zalbûn bi ser pirsgirêk û arîşeyan weke erkek li ser milên hêzên siyasî da zanî.

Her di vê rojê de, heyeta PDKÎ tevlî berpirsên komîteya bajarê Çomanê, di gundê "Aşî Biregiwêz" de, di merasîma sersaxî a wan 2 qurbaniyan de beşdarî kirin, û hevxemiya PDKÎ ji malbata qurbaniyên vê bûyerê re ragehandin, û herwiha tekez li ser pitirkirina pêwendiyên dostayetî di navbera her du aliyên kurdên Rojhilat û Başûr de kirin.

---

pêşnimêjê demkî ê Tehranê cardin êrîş kire ser Rûhanî.

Ji bilî valahiya di navbera binajoxwazan û reformxwazên dewletî, heyamek e ku girûpa Ehmedînijad jî cardin, serî hildaye, û bûye baseke germ di nava baskên cuda û komeleyên navxwe de.

Destbiserkirina Hemîd Beqayî yek ji cihgirên Ehmedînijad di serdema serkomariya navbirî de, bi tawana gendeliyê û axavtinên tund ên Beqayî li dijî dezgeha Dad piştî azadbûnê, herwisa axavtinên Meşayî li dijî vê dezgehê, êrîşên bêmînak in ku di navxwe ya welat de li dijî dezgeha Dad kar kirine, ku serokê wê ji aliyê weliyê feqîh ve tê diyarîkirin.

Ehmedînijad jî her di vê boneyê de, bas ji destpêka serdemeke nû (dewreyeke nû dest pê kiriye) dike û gefa dixwe ku rastiyan wê bêje xelkê. Niha Ehmedînijad û alîkarên herî nêzîk ên wî di serdema serkomariyê de, her yek bi komek dosiyeyên terorîstî ve, wê lêpirsîn ji wan bihê kirin, lê dengê wan gellek cesûrane ye, û bi bê tirs li dijî dezgeha Dad sekinî ne, niha di vê derheqê de, ew pirsyar heye, ku gelo Dezgeha Dad lêkolînê ji vê dosiyeyê dike, û cezaya hewce bo tawanbaran derdike, yan ji tirsa gefên Ehmedînijad, wê bêdengiyê lê bikin?

Valahiya di navbera baskên rejîmê de mezin bûne, û mezintir jî dibin, hekî bo heyamekê jî, bi her sedemekê ew baskên rejîmê bêdeng bin jî, lê her wê serî hilde. Bandora van kêşane, û axavtina wan li ser hev bandoreke baş heye:

Yekem- Xelkê Îranê baştir û zêdetir hikûmetekê nas dikin, ku nêzî 40 salan e hukmê bi ser wan de dike, û bingeha aborî, siyasî û heta exlaqî a vê civakê jî ser û bin kiriye.

Duyem- Ew bersivên şerxwazane moralê dide xelkê, ku ew jî li dijî binpêkirina mafên xwe rabin ser xwe, bi taybetî bersivên şerxwazane ên serkomar li dijî Weliyê Feqîh.

Dûredîmenê Komara Îslamî a Îranê

Li gora vê lêkdaneweyê, rewşa Îranê li derve û navxwe hekî hevpeymaniya Erebistanê jî li rex wê danin, dûredîmenê pêşeroja Îranê, Îraneke şikestxwarî ji derve, di biyavê aborî û siyasî de piştguhxistî, di navxwe berevrû digel kêşeyan û netebahiya kelekebûyî ku rojane zêdetir dibe.

Di vê rewşê de, egera serhildana xelkê li dijî rejîmê, bi sedema dijwarbûna rewşa jiyana wan û nebûna azadiyan, bi pêşdestîkirin û navtêdana aliyê derekî, egereke çavnihêrkirî ye.

---

* Ev gotara beşek ji rapora siyasî ya nivîskar bo 17.mîn civîna Komîteya Navendî a PDKÎ ye ku bi hinek destkarî ve tê belavkirin.

1-Bercam (bernameya tewaw ya kiryara hevbeş) li Îranê bi girêbestekê tê gotin, ku welatên 5+1 derheq pêşîgirtina ji Îranê derheq bi hewlên wê, ji bo ber bi pêşvebirina bernameyên wê ên navikî digel wî welatî îmza kirin.

www.parsvakurd.org

## Yad û bîra şehîdên Mîkonos û cangoriyên dehka 60`î di Alman de wê bilind bê nirxandin




**Rêûresmek bi boneya rêzgirtina ji yad û bîra şehîdên Mîkonosê û cangoriyên dehka 60`î di Birlînê de wê ji aliyê Navenda Penaberên Siyasî ên Îranê wê bi rê ve here.**

Di vê merasimê de Birunu Yost, serdozgerê xanenişîn ê Federal derheq aliyên hiqûqî ên dadgeha Mîkonosê wê axavtinekê pêşkêş bike.

Herwisa Şûra Mekarimî ji paşmayiyên cangoriyên dehka 60`î wê derbarê tundûtîjiyên bingehîn û siyasetên înkarkirinê di Îrana îro de wê baxive.

Ew merasim roja Şemiyê 16.09.2017`an di Kargeha Ferhengan de wê bi rê ve here.

Terora Dr. Şerefkendî û hevalên wî li 26'ê Xermanana 1371 (17'ê îlona 1992)'an li Birlîn a Serbajarê Almaniyayê li halekê de hat encamdayîn ku tenê 3 sal bi ser terora Wiyenê re derbas dibû ku têde Dr. Ebdulrehman Qasimlo, sekreterê wê demê yê Hizba Demokrat û Ebdula Qadirî Azer, nûnerê Hizba Demokrat li derweyî welat tevî Dr. Fazil Resûl li ser maseya got û bêjê bi destê dîplomat terorîstên Komara Îslamî ve hatin teror kirin û ew dîplomat terorîst jî bi hevkariya dewleta Utrîşê bo Îranê hatin şandin û heya niha jî ew dosya vekirî maye.

Berevajî terora Dr. Qasimlo ku terorîstan karîn ji Utrîşê derkevin û radestî edaletê nehên kirin, lê dosyeya Mîkonosê bi awayek din hat şopandin. Di dosyaya terora Mîkonosê de, her 5 terorîst, berî wê ku bikarin ji Almaniya birewin, ji aliyê dezgeha ewlehiya Alman ve hatin destbiser kirin.

Ew dosya piştî 146 ger civîna dadgehê û guhdarîkirina 176 şahidan, bo midehê 5 salan berdewam kir. Dadgeha Mîkonosê serbarê mehkûmkirina encamderên terorê, rayedarên herî payebilind ên



rejîma Îranê jî bi darêjer û fermanderên terora dijberan li derweyî welat de tawanbar kir û ji ber terorîzma dewletî, ji aliyê dadgeha Mîkonos'ê ve hatin mehkûm kirin.

Dadgeha Bilind ya Alman di 21' Xakelêweya 1376'an de bi awayek fermî navê Ayetula Elî Xamineyî, rêberê rejîmê, Elî Ekber Haşimî Refsencanî, serkomarê wê demê, Elî Ekber Wilayetî, wezîrê derwe yê wê demê û Elî Felahiyan, wezîrê Îtilaata hingê anî û biryara şopandina van 4 kes kesan, wekî darêjer û fermanderên terora Mîkonosê da.

Terora rêberên Hizba Demokrat, îdamên bi kom, kuştinên rêzokî, terora kesatî, cudabîr, endam û alîgirên partiyên opozîsyonê li derweyî welat û dehan trajîdiyên din, beşekî biçûk in ji karnameya tejî cinayet û terorîzma Komara Îslamî ya Îranê.

## Derhînerê fîlma "Cinayeta Muqedes": Vê fîlmê pêşiya gellek teroran girt

**"Cinayeta Muqedes" ji aliyê derhîner Riza Ellamezade ve hatiye amadekirin, ku bas ji terora kesayetiyên siyasî, rexnegir û rewşenbîr ji aliyê hikûmeta Îranê ve dike.**

Di dema dadgeha Mîkonosê de, fîlma "Cinayeta Muqedes" bi zimanên Farsî, Îngilîzî û Hulendî di bernameyên televîzyonî, festîvalên sînemayî û di dadgehan de bona zelalbûna biyavên cur bi cur ên hin dosyiyan hatiye nîşandan.

Ew fîlma belgeyî serbarê belavkirina hinek raporan, hilgirê belgeyan, hevpeyvîna digel malbatên qurbaniyan û wan kesan e ku ji terorê rizgar bûne.

Her derheq vê fîlmê de, Ajansa Kurdpa hevpeyvînek bi derhînerê vê fîlmê re pêk aniye, ku navbirî di bersiva vê pirsyara Kurdpayê de, ku gelo bi baweriya we dadgeha Mîkonosê karî bibe asteng li pêşberî domandina kiryarên terorîstî ji aliyê rejîma Îranê ve yan na, navbirî dibêje: Bi baweriya min, belê. Hukmê dadgeha Mîkonosê rê li pêşiya domandina siyasteên terora dewletî ya hikûmeta Îranê di Ewropa de girtiye.

Wî herwisa bas ji vê kiriye ku Hikûmeta Îranê digel beşa fîlmên belgeyî ên televîzyona Hulendê pêwendî girtin, û hewl da ku wan razî bike, bi belavnekirina vê fîlmê, lê dema ku nekarî heta bi dana pereyeke zaf jî wan razî bike, gefa kuştinê li min xwarin. Lê dîsan jî ew fîlm belav bû, û bandoreke gellek baş li ser, ne tenê bîr û raya giştî ya Ewropayê, belkû li ser bîr û raya giştî ya hemû cîhanê hebû, û roleke mezin hebû di warê eşkerekirina pîlanên piştperde yên rejîmê.




Hêjayî basê ye ku kilûpa fîlmsazên Îranî û Ewropayî jî, piştî 18 salan ku bi ser bûyera Mîkonosê re derbaz bibû, fîlmeke bibelge çê kiribû, ku derhînerê wê Arman Necm bû, û navê fîlmê jî "Teror di Berlînê de" bû. Her di vê derheqê de, Ajansa Kurdpa hevpeyvînek digel derhînerê vê fîlmê jî pêk aniye.

Derhîner di vê hevpeyvînê de dibêje ku ew fîlm hişyarhêlana vijdana dîrokî ya neteweyekê ye. Ez jî wekî fêlmsazek min hez dikir ku girêdayîbûna exlaqî û civakî ya xwe bi cî bînim.

Arman mecd derhînerê vê fîlmê, dibêje ku hekî em vê cinayetê bîra xwe bibin, ewê bibe sedema dubarebûna van cinayetan, lewra emê hertim van cinayetên Hikûmeta Îslamiya Îranê bînin bîra xwe, û emê mehkûm bikin.

www.arsivakurd.org

# Nerîna Lîderan



Mesûd Barzanî: “Em piştevaniyê ji kurdên beşên din yên Kurdistanê dikin”.



Trump: “Kureya Bakur dewleteke serkêş e”.



Yehya El-senwar: “Rejîma Îranê mezintirîn piştevanê gurdanên Izedîn Qesam e”.



Potîn: “ Kureya Bakûr amade ye ku giya bixwe, lê dev ji çeka etomî bernede”.

## Partiya Sosyalîst a Kurdistan bi weşandina daxuyaniyekê kuştina kolberan şermezar kir

**Piştî vê ku du kolber bi teqeya rasterast ya hêzên çekdar ên rejîma Îranê hatin kuştin, û xelkê Banê jî li dijî vê kiryara hovane ya hêzên rejîma Îranê serî rakirin, gellek hizb û rêkxiraw û navendên parêzerê mafê mirovan piştgirî dane vê hereketa nerazî ya xelkê serhildêr ê Banê. Her di vê derheqê de Partiya Sosyalîst a Kurdistanê jî yek ji wan partiyên Kurdistana Bakûr e ku daxuyaniyek di vê derheqê de weşandiye.**

**Deqa daxuyaniyê weha ye:**

Dengê Xwe Li Diji Zordariya Rejîma Komara Îslamiya Îranê Bilind Bikin
Demekê dûr û dirêj e ku hêzên ewlekariyên Îranê li ser tixubûn Başûr û Rojhilat “kolberên” kurd yên ku bi pişta xwe kel û pelan dibine Başûr, û ji Başûrê ji dibine Rojhilat, dikuje û birîndar dike.
Du roj berê ji Pasdarên İranê du kolberên dinê kuştin, ku xalkê Bane bûn.
Ji bona rexnekirina kuştina kolberan, Xalkê Banê li ber fermandariya vî bajarî kom bûn, û dengê xwe li dijî kuştina kolberan bilind kirin.
Karbidestên rejima Îslamiya İranê, şûna ku guhê xwe bidin gel, û daxwaza wan cî be cî bikin, bi tundî êrîşî ser wan dikin.Pasdar û hêzên ewlekariyê yên rejimê jî êrîş kirine ser gel. Di encama êrîşa hanê bi dehan xwepeşander birîndar bûn, û bi dehan kes jî hatine destbiserkirin. Gelê Bane jî bi daxistina dukan û bazarê, bersiva êrîşa rejimê dan.
Tê gotin, ku li bajar û bajarokên dinê yên Kurdistana Rojhilat jî, xelk hem piştgiriya xelkê Banê dikin, û him jî li hemberî kustina kolberan derdikevine kolanan, û dikanên xwe digrin. Xepêşandana xelkê Banê berdewamiya xebata gelê me li Kurdistana Rojhilat e.
Em carekî dinê êrîşa Pasdarên rejîma Îslamiya Îranê bo ser gelê sivîl mehkûm dikin, û carekî dinê piştgiriya xwe ji xebata gelê Kurdistana Rojhilat ji bona azadî û demokrasiyê radigihînin.Em banga hêzên welatparêzên Kurdistana Rojhilat dikin, ku hevkariya xwe xurttir bikin. Em banga NY, dewletên Rojava û rêxistinên mirovdost dikin, ku derheqê êrîşa rejîma Îranê bêdeng nemînin û piştgiriya gelê Kurdistana Rojhilat bikin.

**Partiya Sosyalîst A Kurdistan-PSK**

**05`ê Îlon 2017`an**

## Şepêla Pêşeroja Kurdî derheq bûyerên li bajarê Bane de daxuyaniyek weşand

**Piştî kuştina du kolberan ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve li bajarê Banê û serhildana xelkê bane li dijî vê hovîtiya hêzên rejîmê, Şepêla Pêşeroja kurdî bi weşandina daxuyaniyekê piştgirî da xelkê Bane.**

**Deqa daxuyaniyê weha ye:**

Şepêla Pêşeroja kurdî siyaseta kuştin û bidarvekirina ciwanên kurd li Rojhilatê kurdistanê şermezar dike. Hikûmeta Îranê di çarçovê siyasetên xwe yên faşistî li dijî miletê kurd, roja Duşemî 04.09.2017`an, du ciwanên kurd yên kasibkar bi navên Qadir Behramî ji gundê “wezmille” û Heyder Fercî ji gundê “Şeşe” a ser bi bajarê Bane, di navçeya “Hingejale” ya sînorî de kuştin. Ev kiryara kuştinê ya ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve, dikeve çarçovê kiryarên terora dewletî de, ku bû sedema peydabûna nerazîbûnek berferh li bajarê Bane li kurdistana Îranê, ku bi hezaran xelk rabûne ser xwe, û dest bi xwepêşandanê kirin, û bazar bi yekcarî hat daxistin. Xwepêşenderan daxwaza ragirtina zincîra kiryarên armanckirin û kuştina sivîlan kirin.

Xwepêşanderan dergehê avahiya fermandariyê û sercem dikan û cihên bazirganiya bajar daxistin. Lê ew rastî gazên rondikrêj û gulleyên pilastîkî hatin.

Em wek Şepêla Pêşeroja kurdî li Sûriyê bi tundî kiryarên rijêma Îranê ya faşist û kuştina xelkê kurd reswa û şermezar dikin, ku bi dehan ciwanên kurd û nemaze xelkên kasibkar li navçeyên sînorî bi bihaneya qaçaxiyê heya niha hatine kuştin.
Hevdem Şepêla Pêşeroja kurdî bangwaziyê li deste û saziyên navdewletî dike bo ragirtina zincîra kuştin û komelkujiyên derheq ciwanên kurdan de çê dibin, nemaze kiryarên sêdaradanê yên li dijî çalakvanên kurd, li hember vî siyaseta faşist ya rijêma Îranê de bêdeng nemînin.

Di dawiyê de em hevxemiya xwe ligel miletê kurd li Rojhilatê kurdistanê radigehînin, û herwiha em daxwaza anîna fişaran li ser rijîma Îranê ji aliyê Netewên Yekgirtî ve dikin, ji bo rûbirûbûna destêwerdana wê ya li tevaya navçeyê, û nemaze di Sûriyê û Kurdistana Başûr de, û bang li partiyên kurdistanê û rêxistinên mafên mirov yên kurdî û navdewletî dikin ji bo şermezarkirina siyaseta rijîma Îranê ya faşist û dagîrker ya radibe bi piyadekirina siyaseta qirkirinê û komelkujiya bernamerêjîkirî, nemaze di derheq gelê kurd û çalakvan û siyasetmedarên Kurdistana Rojhilat, bêdeng nemînin.

**Desteya serkirdayetiya Şepêla Pêşeroja kurdî li Sûriyê**
**04.09.2017**

www.arsivakurd.org

# Gotûbêjek digel Dr. Xelîqî kesayetiyê naskirî yê Kurd û civaknas derheq hinek pirsên girîng ên siyasî di navçeyê de



**Wekî min got, Îran bi tîrekê du nîşanan dipêke, ya yekem eva ku Şî`eyên Îraqê stûxwarê xwe bike, ji bo nexşeriya xwe. Ya duyem jî bi vî awayî pêşiya serkeyina doza Kurd bigre**

**Pirs: Di çend rojên borî de, bi handana Îranê, hêzeke çend hezar kesî a DAÎŞ`ê berev sînorên Îraq û Kurdistanê hatine anîn. Gelo hûn di bereberê referandomê û rage-handina serbixweyiyê de, vê yekê çawa dinirxînin?**

**Bersiv:** Armanca Îranê, mijûlkirina Kurd û Şî`e ye bi şerê DAÎŞ`ê û herwekî min got, bona gihîştina bi van du armancan e ku min di vir de bas kiri, ku hekî serwext nebin wê bidorînin.

H: Selîm Zencîrî

**Pirs: Gelo hûn kêşeya tayifegeriyê di navçeyê de, di çi de dibînin?**

**Bersiv**: Çarçoveya qonaxeke civakî di civakeke kêm çalak de, dereng dereng guhertin bi ser de tê. Di van civakan de, zêdetir hest bi ser ramanê de zal e. Lewra bi hêsanî xelkê wê civakê dikeve bin bandora niyet-nepakan de, û bo encamdana hinek kiryarên cihê heyrîmanê têne tûjkirin. Derbazbûna qonaxên bi vî rengî bi çalakkirina biyavê perwerdehiyê û binke û binyatên civaka medenî pêk tê.

**Pirs: Gelo vê kêşeyê reh û rîşeyeke dîrokî heye, yan bi serhildana girûpên Îslamî zêdetir bûye?**

**Bersiv**: Wekî min got, eva ber û encama rewşa dugm ya çanda eşîretiyê ye, lewra kes û girûpên niyetpak û kole dikarin ji vê rewşê bo gihîştina bi armancên dijî mirovî ên xwe mi-fahê bistînin.

**Pirs: Qedera navçeyê serbarê van kêşeyan ber bi kuderê ve diçe?**

**Bersiv:** Hekî aliyên xwedîpêwendî û berpirsyar jîrane û hişyarane rêçar-eyeke bicî ji bo vê rewşê nebînin, wekî niha tevdanîkar wê bibin tenê lîstikvanê vê qadê. Yê ku daxwazkarê guherînkariyên erênî ye, dibe ku ji-yarane û derûnnasane digel de reftarê bike, û karekî bike, ku neyar bi kevirê firtûfêlan û xapandinê dîwarê şûşe hûr-hûr nekin.

**Pirs-Rola Îranê di vegeşîna vê kêşeyê de hûn çawa dibînin?**

**Bersiv:** Diyare ku Îran li dijî tekoşînê û li dijî berjewendiyên aliyê din, her çi ji desta bê encam dide, eva erk û wezîfeya şoreşgerê hişyar e ku bi helwest û kiryarên bicî û rewşnasane, gevriya wan pilanên dijmin wisa bigivişîne, ku bi qa-zancê xwe mifahê jê bistîne. Dav û tevlik her tim li ser rê hene, lê eva nêçîrê hişyar e ku dibe xwe ji wan derbaz bike.



**Pirs: Bi baldan bi xwedûr-girtina hindek ji aliyên Şî`e ên Îraqê, wekî Sedr û Hekîm û nêzîkatiya wan ji Erebistanê, gelo we jêve ye ku guherînkariyên vî welatî ber bi kuderê û çi encamekê ve diçin?**

**Bersiv:** Îran bi bername ve mijûl e ku navçeyên Şî`e akincî heta Lubnanê bixe bin bandora xwe de, lewra di hemberî dijberan de, her çi di şiyanê de be dike. Eva ji aliyekî ve, û ji aliyekî din ve, bona têkbirina referan-doma Kurdistanê, hewcedarê te-vdanîkariyên nû ye, ku Kurd tûj bike, ku dev jê berde, û di heman demê de, bi mijûlkirina Kurd bi vî şerî sînorên xwe, ji şerê DAÎŞ`ê piştî derkirina ji Îraqê biparêze.

**Pirs: Di vê navberê de, rejîma Îranê çi dikare bike?**

**Bersiv:** Wekî min got, Îran bi tîrekê du nîşanan dipêke, ya yekem eva ku Şî`eyê Îraqê stûxwarê xwe bike, ji bo nexşeriya xwe. Ya duyem jî bi vî awayî pêşiya serketina doza Kurd bigre.

**Armanca Îranê, mijûlkirina Kurd û Şî`e bi şerê DAÎŞ`ê ye**

**Pirs: Tevî hebûna vê kêşeya kûr, piraniya hizbên Kurd ên Îranê jî, sekolar in, gelo we jêve ye ku şêweya rast ya karê wan çawa be?**

**Bersiv:** Rewşnasîn û dijminnasîn yek ji pêpkên xebata bo gihîştina bi aza-diyê ye. Her rêkxirawek xwediyê van taybetmendiyan nebe, nikare serkev-tinê bi dest bixe.

**Pirs: Hevdem li Kurdistana Rojhi-lat herdu pêkhateyên mesebî Şî`e û Sunî hene, di vê derheqê de çawa hevsengî tê çêkirin, ku meseb nebe faktera yekalîker?**

**Bersiv:** Reftar û darêtina bernameya xebatê dibe ji destêwerdana dîn û ayînzayan bi dûr be, û xebat bo rizgarkirina mirovê çewsawe be, bi bê berçavgirtina van cudahiyên rûkeş. Bi xweşî ve xebata me di vê derheqê de dûr e ji van rengan.

www.e

# Rejîma Îranê bajarê Banê milîtarîze kiriye

**Berpirsên rejîma Îranê di bajarê Banê de, bi awayekî tund rewşa hatin û cûyîna hemwelatiyan xistine jêr çavdêriya xwe de.**



Li gora nûçeya gihîştî malpera Kurdistanmedia, piştî girevê, hemwelatiyên bajarê Banê çûne ser şeqaman, û li dijî berpirs û navendên ewlehiyê ên rejîmê, diruşm dan, û cinayetên hêzên leşkerî yên rejîmê şermezar kirin, û berpirsên rejîmê jî gefan li hemwelatiyên wî bajarî dixwin, û rewşa awarte ragehandiye û herêm militarize kiriye.

Nûçegihanê malpera Kurdistanmedia di vê derheqê de ragehandiye ku, avahiya fermandariya bajarê Bane, bi berbestan pêşiya wê girtine, û rê bi hatin û çûyîna xelkê, ji rêya şeqama fermandariyê re nahê daîn.

Herwiha deriyê fermandariyê jî hatiye şikênandin, û xwenîşanderan du kiyoskên pasebaniyê jî agir berdanê.

Herwiha tevî vê yekê jî dezgeh û navendên ewlehiyê yên rejîmê, berpirsên pirraniya navendên medyaî, girûp, kanal û torên civakî, ji bo Îdareya Îtila`ata bajarê Banê gazî kirine, û azar û eziyeta wan kirine.

Nûçegihanê malpera Kurdsitanmedia herwiha ragehandiye ku, hêla înternêta bajarê Banê û deverên derdora wê hatine qutkirin.

Hêjayî basê ye ku, di doma rewşa awarte a bajarê Banê de, berpirsên rejîma Îranê, beşa hewarhatina nexweşxaneya wî bajarî jî daxsitine, lê belê girev her dom heye.

Herwiha ji tirsa xelkê Kurdistana Rojhilat û xwenîşanderên roja derbazbûyî, fermandariya bajarê Merîwanê hemû saziyên sivîl gazî kirine, û ji wan daxwaz kiriye da ku bi tu awayekî di vê girevê de beşdar nebin, û hindek sozên weke danîna peykera mamosta Qanê`i, û herwiha soza nedanîna tu berbestekê ji wan re bo birêvebirina kongire û sêmînaran daye.

# Piraniya Mu`itadan di Tehranê de



**Li gora serjimêriyan, rojane 1 heya 1.5 ton mewada muxedir di Tehranê de dibe dûkel.**

Sekreterê Civata Hevahengiya Xebata Li Dijî Madeyên Hişber a Tehranê amara mu`itadan di Tehranê de belav kir, û hûrdekariyên rojane derheq bikaranîna mewadên hişber belav kiriye.

Elî Esedî, di gotûbêja digel Tesnîmê tevî îşarekirian bi hejmara mu`itadan di Tehranê de ragehand: Li ser bingeha lêkolîma herî nû, di nava 2 milyon û 800 hezar kesên mu`itad de, heşîmeta mu`itadan di Tehranê de, ji sedî 2-3 a hemû nifûsa mu`itad ya Îranê de ye.

Navbirî îşare bi vê kir ku herçend amareke rast derbarê rêjeya mu`itadan di Îranê de li ber dest de nine, lê bi awayekî navgîn hekî mezaxtina rojane a her mu`itadekê 1 heya 2 gm be, wê demê bi hêsanî derdikeve ku di Tehranê de rojane çiqas mewad tê kêşan.

Sekreterê Civata Hevahengiya Xebata Li Dijî Madeyên Hişber a Tehranê di dawiyê de ragehandiye ku nifûsa mu`itadan di Tehranê de di navbera 560-840 hezar kesî ye, û eva di demekê de ye, rojane 1-1.5 ton madeyên işber di Tehranê de dibe dûkel.

Hêjayî basê ye ku tenê di dema weşandina amaran de eşkere dibe, ku hejmara mu`itadan di Tehranê û bajarên din de gellek zêdetir e ji Kurdistanê, lê eva rejîma Îranê ye ku bi siyasetên xwe yên nerats û çewt wisa di bîr û raya giştî de nîşan dide, ku eva Kurdistan e ku bûye navenda bikaranîna madeyên hişber.

# %70 a bêkaran ji texa ciwanan in

**Di Îranê de, niha nêzî %70 a bêkaran ji texa ciwanan in, û heyama bêkariya nîva wan jî, zêdetir ji 2 salan e.**



Resûl Sadiqî alîkarê biyavê lêkolîna navenda li ser nifûsa welat serbarê vê ku bas ji asta bêkariyê di nava ciwanên welat de kiriye, di heman demê de jî, ragehandiye ku temenzê zewacê di nava ciwanan de jêhel çûye, û di sala 1390`î de, nêzî %40 ji nifûsa kur, heya temenê 30 saliyê jî nekarîne bizewicin.

Her di vê derheqê de navbirî bas ji vê kiriye ku rewşa hemû parêzgehan di vê derheqê de ne wekhev e. Li gora gotina navbirî bêkarî û nebûna ewlehiya şuxlî astenga herî sereke ye li ser riya zewacê, û ragehand: Ji bo keçan gellek girîng e ku berî zewacê, bîr ji jiyana hevbeş bi kesekî re bikin ku kar hebe. Di hinek yasa û layiheyên pesendkirî ên meclisê de hatiye ku dibe derfeta kar destpêkê bo kesên zewackirî hebe, lê ew yasa dibe sedem ku girîngî bi texa ciwan nehê dayîn, û roj bi roj rêjeya bêkariyê zêde be, û bibe kêşeyeke cidî li ser riya zewacê.

www.sirsiyan.org

## Jînenîgariya Nadir Nadirov serokê Rûmetê yê Yekîtiya Kurdên Sovyêtê û Endamê Assamblêya Gelên Qazaxistanê, Endamê Herdemî yê Akademiya Zanyariyê ya Neteweyî ya Qazaxistanê, ku wek “Marşalê Petrol û Gazê” û ”Marşalê Zanyariyê” tê nasîn, derbarê gişţpirsîyê di Herema Kurdistanê de kir.

Nadirê Kerem Nadirov di 6`ê meha çileya sala 1932`an de li gundê Qîqaça Nexçiwanê ya komara Azêrbaycanê tê dinyayê.1936’ê salê bavê wî Keremê Hacî Nadir diçe rehmetê. Gava bavê wî wefat dibe, ew 5 salî ye tevî diya xwe 9 kes, sala 1937’ê ji Kafkasyayê ber bi Qazaxistanê ve têne sirgûnkirin.

Nadirê Kerem ji ber ku Kurdekî sirgunê ye, di warê xwendinê de zehmetiyên giran dibîne. Pêşî nahêlin ji gundekî here gundekî din. Paşê destûra xwendinê didin, lê tenê ji bo bajarên biçûk 1948-ê salê ji kurdên ku hatibûn sirgunkirin ji navçeya Cambûlê ya komara Qazaxistanê, ew kesê yekemîn bû ku mekteb xelas kiribû

Ji bo destanîna xwendina bilind dixwest here Moskvayê yan jî Almatayê, le rêvebirê Sovetê îzina xwendina wî li bajarê mezin de nedane, le di sala 1956ê de, piştî mirina Stalîn û hatina Xrûşçov astengîyên li ber xwendina wî û bi hezaran kesên wek wî radibe, û Rêya çûna Moskvayê jê re vedibe.

Ew Înstîtûya Pedagogî ya Kizilorda ya Qazaxistane temam kir. Ew wek mamoste li Qazaxistanê dixebitî. Ji sala 1959 ew serokê kafêdra kîmîyayê ya Înstîtuta Xabarovskê bû. Piştre wek serokê teknolojîya daxebitandina bû, paşê wekî prorektorê beşa zanistî ya Înstîtûya Teknolojiya Kîmîkî ya Çîmkentê dixebite.

Ji sala 1975`an rêberê Enstîtûya Kîmîyayê û Sazîyên Navnetewî ya Akadêmîya Zanîngeha KSS-Guryêvoyê bû, û nenihêrî dijwarîyên jîyanêye mezin Nadir Nadirov gihîşte hêlanê profêsîonalî yê bilind. Akadêmisyen û Profêsor Nadir Nadirov li seranserê cîhanê, yek ji navdartirîn zanyarê pêtrol-kîmyayê ye. Doktorê zanyarîyê yekemîn ji kurdên Sovêtê û ji sînorê wê der bû akadêmîsyan.

Di destpêka salên 1990î de Nadirê Kerem yek ji demezirînerê Akadêmîya Zanîngehên Komara Başkorstan bû. Ji sala 1991 de ev Akadêmîsyanê rûmet a Akadêmîya Zanîngeha Komara Belorûsyayê ye. Serokê Rûmetê yê Yekîtiya Kurdên Sovyetê û Endamê Asamblêya Gelên Qazaxistanê ye. Ji sala 1993an ve Endamê Herdemî yê Akademîya Zanyariyê ya Neteweyî ya Qazaxistanê ye. Profêsor û pisporê kurdê Sovyeta berê Nadir Nadirov wek “Marşalê Petrol û Gazê” û “Merşalê Zanyariyê” tê nasîn. Ev ewledê hêja yê gelê Kurd heta niha bêhtirî 950 gotarên zanistî nivîsandine. Nadirê Keremê Nadir, di warê petrol û gazê, enerjîya bayê, enerjiya rojê û enerjiya avê de xwediyê 250 patentên zanyarîyê ye. 35 kitêbên wî hatine weşandin. Du kitêbên wî li ser jîyana wî û jîyana kurdên Qazaxistanê ne.




Nadirov ji sala 1996’an ve berpirsyartîya kovar ‘Petrol û Gazê’ dike ku bi rêvebirîya wî dest bi weşanê kiriye. Akademîsyen Prof Dr. Nadir Nadirov di sedsala 20’an de di cîhanê de zanyarê yekemîn hatibû hilbijartin. Ji sala 2017an serokê hurmetlî yê Kongrêya Komeleyên Kurdên Sovêta berê ye. Nadirov dostanîyeke germ di gel serokkomarê berê yê Qazaxistanê Dinmuhammed Kunayev, him jî niha Nûrsultan Nazarbayêv re dike. Ewan herdu serok jî qedir û hurmeteke mezin didan ked û zanyariya wî.



Nadirov xwediyê van xelatan e: ‘Pêşengê perwerdehiya Gel a Sovyeta Sosyalîst’ (1967), ‘Xelata Dewletê ya Qazaxistanê ya Komarên Sovyeta Sosyalîst’(1980), ‘Xelata Kedkarê Emekdar a Qazaxistana Komarên Sovyeta Sosyalîst’ (1982), ‘Xelata Kaşifê Yekitiya Komarên Sovyeta Sosyalîst’ (1985), ‘Petrolkarê Fexrî yê Yekitiya Komarên Sovyeta Sosyalîst’ (1991), ‘Endezyarê Muhteşem yê Sedsala 20’an’ (2000) ‘Endezyarê Fexrî yê Qazaxistanê’ (2001) Nadir Nadirov di sala 1981’ê de layiqî ‘Medala Kedê ya Ala Sor’ a Sovyetê; di sala 1999’an de layiqî medala ‘Hurmetli’ a Qazaxistanê û di sala 2006’an de jî layiqî mêdala ‘Dostanîyê hatiye dîtin.

Di sala 2003’yan de li Fransayê, ji hêla Yekitîya Piştgirîkirina Senaya Navneteweyî ve, ji bo keda wî ya pêşdebirina senayiyê bi ‘Mêdala Zêrîn’ hatiye xelatkirin. Heman dezgeh di sala 2004’an de tevî “Mêdala Napolêon”, nasnavê “Merşalê Zanyariyê” jî daye Nadirov ji bilî van xelatan Nadirov xwediyê bi dehan xelatên dewletî û navdewletî ye.Eger em hemû ked û xebatên wî, xelat û berhemên wî we re bejin, bawer bikin çend saet jî têrê nedikir. Nadirê Kerem Nadirov zewicîye, 3 kur û 10 nebîyên wî hene. Vê demê di gel malbeta xwe li bajarê Almatayê yê komara Qazaxistanê de dijî.

**Çavkanî: Radyoya Riataza**

## Li Îtaliyayê derhînerekî kurd, baştirîn xelata dêkyomêntî bi dest xist

**Berhema derhînerekî Kurd, xelata baştirîn dêkyomênta kurt di beşa navdewletî a festîvala Lukaniya a Îtaliyayê bi dest xist.**

Li gora raporên belavbûyî, berhema dêkyomêntî a bi navê “Li tenêşta min” ji derhînan û nivîskariya Zaniyar Mihemedî Nikû xelata baştirîn dêkyomênta kurt a beşa navdewletî a festîvala Lukaniya a welatê Îtaliyayê bi dest xist. Ev dêkyomênta 6 deqeyî, ji aliyê vî derhînerê kurd ve hatiye çêkirin.Herwiha vê dêkyomênta di demên derbazbûyî de jî, di festîval “CSFF” a Amerîkî de jî, xelat wergirtbû.Zaniyar Mihemedî Nîko di sala 1372`an li bajarê Bokanê hatiye dinê, û karnas û mamostayê werzişê ye.

Navbirî di sala 1392`an, bi çêkirina kurte fîlmeke bi navê “Weke zindiyekê “ karê xwe bi awayekî pirofişinal dest pê kiriye, û piştî vê dêkyomênta “ Li tenişta min “ kurte fîlmeke din a bi navê “ Bîreweriyên min ên biherî “ (Xatiratê Giliyê Men) çêkiribû.

www.agirikurd.org

# Zimanê Kurdî

## Van pirsan bi xwe bibersivîne:

**Li welatê te rewşa siyasî çawa ye? .....**
**.....**
**.....**
**.....**
**.....**
**.....**
**Tu ji rewşa li welatê xwe dilxweş î? Çima "erê", çima "na" binivîse: .....**
**.....**
**.....**
**.....**

**dilxweşkirin - li ber yekê, li ber yekî xweşkirin**
**Dewran û Baran hevalên hev ên zanîngehê ne. Li qehwexaneya zanîngehê rûniştine û li ser rewşa hev diaxivin:**

**Dewran: Kekê Baran tu dawiya vê hefteyê çi dikî?**
**Baran: Min soz daye hevala xwe. Emê bi hev re derkevin, xwarinekê bixwin.**
**Dewran: Xweziya min bi dilê te. Ew keçikeke gelekî xweşik e.**
**Baran: Spas dikim. Bi rastî him xweşik û him jîr e.**
**Dewran: Belê. Bextê te vekirî ye. Wekî yê min derî tev li xwe negirtine.**
**Baran: Tu jî hinekî zimanê xwe xweş bike, wê ji dora te jî bicivin.**
**Dewran: Çawa?**
**Baran: Divê tu zanibî bê dilê wan çawa tê xweşkirin.**

**Êvara şemiyê:**

**Baran: Tu bi xêrê hatiyî Dilcan! Tu îroj ji her roj xweşiktir bûyî. Her derê te diterise!**
**Dilcan: Spas Baran. Ew xweşbêjiya te ye. Tu dizanî ku ez nizanim makyajê bikim.**
**Baran: Ji te re pêwîstî bi makyajê tine ye. Xweşikbûna te ya xwezayî têrê dike û zêde ye jî.**
**Dilcan: Te dîsa dest pê kir. Tu dizanî ku ez ji dilxweşkirina zêde hez nakim.**
**Baran: Na, bi serê min û te, ez ji dil dibêjim.**
**Dilcan: De dev jê berde. Te ji xwe re kar dît? Te gotibû ezê havînê herim li der ve bixebitim û pê re zimên fêr bibim.**
**Baran: Min ji çend welatan re nivîsandiye. Ez li hêviya hatina bersiva wan im. Gava bigihêje ber destê min, ezê te agahdar bikim.**
**Dilcan: Tu mirovekî bi kêrî xwe tê yî. Tu dizanî çi, çawa bikî.**
**Baran: Ne bi qasî te. Yê te, kar tê ber lingên te, yê min, ez li kar digerim.**
**Dilcan: Dîsa jî tu bikêrhatî yî.**
**Baran: Niha jî tu dilê min xweş dikî! Ka ez te bibim ku derê îşev ku em xwarineke xweş bi hev re bixwin?**
**Dilcan: Em herin wê xwaringeha li ber avê. Li ber avê bêhna min derdikeve.**
**Baran: Bi rastî di dilê min de jî ew der hebû. Min bêriya masiyan kiriye!**

www.arsivakurd.org

## Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- Sed Dînar te yên heyn bû kirîna sed pezî (mih, beran, berx). Her beranek bi 5 Dinaraye, her mihek bi Dînarekêye û her berxek bi Derhemekiye. Erê çawa dê kirî ku parê te têra te bikit û çi ji ber zêde û kêm nebinn û ji hemî toxma bikirî ?
Bersiv: (* 19 beran/95 Dînar, 1 mih/ 1 Dînar, 8 berx/ 4 Dînar)

- Bi sed Dînara divê sed dewara (hesp, hêstir û ker) bikirî,
bi mercekî her hespek bi 4 Dînaraye, her hêstirek bi nîv Dînarêye û her kerek bi çareka Dînarêye.
Metelokanên zaroka--Mahir Berwarî-2009 88
Bersiv: (* 15 hesp/60 Dînar, 75 hêstir/37.5 Dînar, 10 ker/ 2.5 Dînar)

- Êkî du sêv dane du kurr û du baba her êkî sêvek gehiştê ?
Bersiv: (* kurr, bab û bapîr)
- Aşvan bi xwe û jina xwe ra, karwanî bi xwe û xweşka xwe ra. Sê hinar danê her êkê/î hinrek giheştê.
Bersiv: (* Jina aşvanî xûşka karwançî ye.)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

**Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin**

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (309)


## Çend wêne ji meşa nerazîbûna xelkê Banê li dijî hêzên rejîmê






















